

# **Sten Arevik û Ove Hartzell**

Sertwêjêk le kitêbî

## **Xuyakirdinî bîrkirdinewe**

derbarey fêrkirdinêkî çemikamêz

Nêwî ktêb be zimanî swêdî:

Att göra tänkande synligt: en bok om begreppsaserad undervisning.

Sten Arevik, Ove Hartzell.

Liber 2015.

Em berheme be elfbêy aramî:

[https://komak.nu/Kurdi/Kteebkhane/KteebiKOMAK\\_PDF/Xuyakirdni\\_Birkirdnewe.pdf](https://komak.nu/Kurdi/Kteebkhane/KteebiKOMAK_PDF/Xuyakirdni_Birkirdnewe.pdf)

## **Pêrist**

Amanc le “xuyakirdinî bîrkirdinewe” .....	3
Twanistî bîrkirdinewe .....	3
Kam ziman? .....	4
Şadozî fêrkarî .....	5
Sazandinî çemikamêzaney zanyar .....	5
Twanistî bîrkirdinewe .....	6
Nimûneyek le çemikzanî .....	6
Bannorîyek le twanistekanî bîrkirdinewe .....	7
Wirdekarîy twanistekanî bîrkirdinewe .....	9
1) Twanistî sistemandin û nexşdozî .....	10
2) Twanistî giştandin .....	11
3) Twanistî dîtinî akamî berşyan le karêkî mirov deykat .....	12
4) Twanistî helwêstgirtinî kesekî .....	14
5) Twanistî bîrkirdinewey rexnegir .....	14
Destey dûhem, twanistî bîrkirdinewey xawen binemay zimanekîy aloz (6-10) .....	15
6) Twanistî têgeyîştinî kêşey sakarandinî dakewt .....	15
7) Twanistî hoşgêran le nêwan cûte layenî derhest û berhestda .....	17
8) Twanistî puxtandin û peybirdin be peyamî babet .....	18
9) Twanistî bekarhênanî çemik û rwangey hemecorî zimanekî wek destawêjî bîrkirdinewe .....	20
10) Twanistî rwangegorkê le cêge û katda .....	21
Destey sêhem .....	23
11) Twanistî pejrandinî çemikî nwê .....	23
Serçawe .....	24

## Amanc le “xuyakirdinî bîrkirdinewe”

Amanc birîtîye le xuyakirdinî tawî ziman Leser bîrkirdinewe û herweha xuyakirdinî ewey le peywendîy nêwan ziman û bîrkirdineweda peyda debêt û pêwîste le fêrkarîda têçên bikirêt. Mebest base le çemik û çemikzanîy weha ke mirovî hoşmend be yarmetîy destawêjî hêmakar<sup>1</sup>ewe deyhênête berhem. Destawêjî here girîngîş lêreda zimane, zimanî hem axaftin û hem nûsîn.

## Twanistî bîrkirdinewe

Twanistî bîrkirdinewe wate: bîrkirdinewey saxtarbend bo sazandinî<sup>2</sup> ezmûn,<sup>3</sup> agadarî<sup>4</sup> û zanyar.<sup>5</sup> Em twanistgele destawêjî zimanekî û awezmendanen bo sazusewda legel dewrûberda. Çemikî “twanistî bîrkirdinewe” hewildanêke bo nawzedkirdinî beşêk lew pêvajogeley<sup>6</sup> serbe ziman û zanandin,<sup>7</sup> ke mirov bo sazandinî ezmûn û agadarî, deyançerxênêt. Lem baseda, ew “twanistaney bîrkirdinewe” dêne diyarîkirdin û ravekirdin ke pêwîste fêrxwaz le prose y fêrbûnda peydayan biken. Herweha bas lew helûmerceş dekirêt ke pêwîste bo geyştin bew “twanistane”.

Le fêrkarîda rehende corawcorekanî nêwerokî babet dêne xuyakirdin. Lêreda sê rehendî zanyar, dêne berbas:

- Rehendî çemikamêzî<sup>8</sup> zanyar - agadarîy saxtarbend û çemikamêz, agadarîy corekî
- Rehendî çendekîy zanyar - agadarîy saxtarbender û pert, agadarîy çendekî
- Zanyar le ezmûnî berhestewe<sup>9</sup>

Sazandinî corekîy zanyar wate sazandinêkî wehay zanyar qûlayî çemikamêzî hebêt. Vygotsky delêt:

*Zanyarêk xawen qûlayî çemikamêz bêt eweye le nihomêkî agayaneda lay ême watadare. Le bestêninêkî<sup>10</sup> mebesthelgirda bûnî heye. Em zanyare hevbendîy heye legel jiyan û ezmûnî xomanda, legel saxtar û bestênî dîkey mebesthelgirda hevbende. Em zanyare le bestênêkî civakîda berderike.<sup>11</sup> Em zanyare le hevbendî letek çemik, boçûn, bîroke û bîrdozey dîkey peywestda berderik debêt. Em zanyare be corêk rêkxirawe ke ême bitwanîn be kesanî dîkey rageyenîn. Zanyarî çemikamêz tenha le sîstemda debête agayane û agakird.<sup>12</sup>*

<sup>1</sup> Hêma: symbol, hêmakar: symbolic.

<sup>2</sup> Sazandin: treatment, processing, çarekirdin, rêkxistin.

<sup>3</sup> Ezmûn: experience, tecrebe.

<sup>4</sup> Agadarî: information.

<sup>5</sup> Zanyar: knowledge, me`rîfe, zanist û huner.

<sup>6</sup> Pêvajo: process.

<sup>7</sup> Zanandin: cognition, ew zanîney be têfikirîn, wîrdûnewe, lêkolînewe, şîrovekarî û... htd peyda dekirêt nek zanînî asayî. Bo “zanandin” birwane Celizade (*Zarawesazîy pêwane*).

<sup>8</sup> Çemikamêz: conceptual, wênakar, bîrdozekî, watadar. Çemikamêzandin: conceptualization.

<sup>9</sup> Berhest: berceste, konkirêt. Bo pêçewaney “berhest” birwane “derhest”.

<sup>10</sup> Bestên: context, buwar, çêwe. Bestênbend: contextual. Babetî bestênbend wate babeteke le bestênî diyarîkirawda seyr dekirêt.

<sup>11</sup> Berderik: understandable, comprehensible, dekirêt bîzanît, têy bigeyt û derikî bikeyt.

<sup>12</sup> Vygotsky (1999), p. 226.

Zanyar ger çemikamêz nebêt be zorî deçête xaney “zanyarî ezberkiraw”-ewe. Binemay em core zanyare birîtiye lewey mirov pênasayekî ezber kirdûwe, fêr bûwe amaje be basêk bikat, besterî sakarî dûr le qûlayî lojîkane binasêt - ewey mirov fêrî bûwe bê ewey têy bigat û bê ewey bitwanêt be şêweyekî watadar raygeyenêt. Bo nimûne dezanim paytextî em welate nawî çîye, belam be wîrdî nazanim watay welat çîye, şar û paytext çîn, çî watayekî siyasî û ferhengîyan le pişte. Zor kes dezanin Albert Eynîştayn (Albert Einstein) xawen “bîrdozey rêjekaretî” (Theory of Relativity) ye û hawkêşey “ $e = mc^2$ ”-î dariştûwe, belam kem kes wirdekarî ew base derik deken.

## Kam ziman?

Ziman ew destawêje ye bîrkirdinewey agayane û sazandinî agayaney zanyar berşyan<sup>13</sup> dekat. Mirov ziman wek destawêj bekar dehênêt bo rûnkirdinewey bîrî hem xoy û hem kesanî dîke. Bîr bew core berderik debin, “çemikamêz” debin. Belam em destawêje zimanekîye lay hemwan le yek astda nîye, piley firajûtînî serûjêre. Zimanî çust lêreda be “zimanî nebestiraw”, “kodî firajûy zimanekî” nawdêr kirawe.

Zimanî nebestiraw zimanekî derhest<sup>14</sup> û mewdagîre.<sup>15</sup> Nebestirawetewe bem dewrebere berhestey êsta û êre. Emyan cudaye le “zimanî bestiraw” ke pitir basî le guzeranî rojaneye.

Zimanî bestiraw tund peyweste be “ferhengî zimanî zarekî”-yewe. Ew ferhengey le rewî mêtûda be palepestoy “ferhengî zimanî nûsîn” rûberî bertesk botewe. Le ferhengî zimanî zarekîda, adgarî wek berhestandin,<sup>16</sup> zimanî ceste û hawayî nêwan axêwer û bîserda berçawin. Lêreda “mebest” girînge bigate kesî beranber.

Le ferhengî zimanî nûsînda, adgarî wek derhestandin,<sup>17</sup> mewdagîrî û peydabûnî derfet bo lêkdanewey corawcorî basêk be nûsîn, xuya debin. Em ferhengî zimanî nûsîne le fêrgeda baladeste û bo beşêk le fêrxwazan kêşedare. Fêrxwaz heye ser bem ferhengî nûsîne nîye û twanay gêranewey basî derhest, basî dûredestî lawaze.

Fêrge û civak daway zimanî nebestiraw deken, wate twanistî bekarhênanî çemikî derhest le zimanêkda mewdagîr bêt lew beserhatey lêy dedûwêt. Fêrge debêt hewil bidat çareyek bo em berokgîrîye zimanekîye bidozêtewe. Fêrge debêt hewil bidat layene behêzekanî zimanî bestiraw, wek berhestandin û zimanî ceste, le rêy xistineserî layene behêzekanî zimanî nebestirawewe, wek twanistî mewdagîrî, şirovekarî û derhestandinî zimanekî, rahêzêt.

Mamosta çon debête yarîderî firajûtînî zimanî fêrxwaz?

“Bîrname” rêbazêkî yarîdere lem buwareda. Mamosta dozêk arastey fêrxwaz dekat, be nimûne le waney civaknasîda depirsêt: “boçî sizadanî mirov le civakî corawcorda bûnî heye?” fêrxwaz paş peycorî, gftugoy nêwxo û raman, boçûnî xoy le bîrnameda tomar dekat. Emeş sê xalî yarîder:

<sup>13</sup> Berşyan: possible, îmkanî heye... Pêçewaney şyanbeder: impossible.

<sup>14</sup> Derhest: abstract (abstrakt), mecaz. Bo pêçewaney “derhest” birwane berhest.

<sup>15</sup> Mewda: distance. Mewdagîrî: distancing.

<sup>16</sup> Berhestandin: concretization. Birwane “berhest”. Bo pêçewaney berhestandin birwane derhestandin.

<sup>17</sup> Derhestandin: abstraction. Birwane “derhest”. Bo pêçewaney derhestandin birwane berhestandin.

- fêrxwaz fêrî helêncanî puxtey bas bê le nêwerokêkî diyarîkirawda, wate dozînewey kirokî bas.
- ewca pêşanî bidat ke pey be peyameke debat, wate xerîkî rahênan bê leser “gwêradêranî çalak”.
- le kotada fêrxwaz pêşanî bidat em waneye çî boçûnêkî lelay çandûwe, wate rahênan leser raman û helwêst wergirtin.

Encamgîrî, gwêradêranî çalak û twanay wergirtinî helwêst karzanîyekî pêwîstin bo firajûtinî ew şêwazaney basyan hat derbarey ziman û bîrkirdinewe. Fêrxwaz lem “bîrname”-yeda pêgey emroy xoy dekate serşar û bedem koşînewe heldekişêt.

### Şadozî fêrkarî

Dozî here bineretîy fêrkarî birîtiye lewey dunyay rastîne, dunyay derewey jûrî pol, bikate babetî nêzîkedest, berderik û bersaz.<sup>18</sup> Eme kêşeye û rojane berokî gişt mamostayan degirêt. Dunyay em serdeme, em dakewtey<sup>19</sup> emro êmey têdayn, hênd aloze mirov natwanêt, her bewendey bûnî têyda heye, derikî bikat.

Rûkarî<sup>20</sup> hemecorî em dakewtey dewrûber dête jûrî polewe û destawêjî sazandinyan birîtiye le bîrkirdinewe û derhestandinî zimanekî ew bîrkirdinewe. Em dakewtey dewrûber tenha be dîtin û bîstin, tenha be rûnûskirdin û ezberkirdin nabête berderik. Säljö<sup>21</sup> y tojerî swêdî bo ravekirdinî em kêşeye çemikî *contextualization - decontextualization - recontextualization* “bestênbendandin - bestênhelweşandin - bestênvebendanin”<sup>22</sup> bekar dehênêt. Dijwarîyekanî lem şadozeda peyda debin daway “twanistî çemikamêz” deken bo derwesthatinî ew derhestandiney pêwîste, bo sazandinî rûkare corawcorekanî dakewt, le polda.

### Sazandinî çemikamêzaney zanyar

Gwastinewey fakt û nawaxin le mamostawe bo mêşkî fêrxwaz ser nanêt be firajûtinêkî çemikamêzaney zanyar. Ewe tenha lebergirtinewe.<sup>23</sup> Cêhêştinî berpirsaretîy firajûtinî zanyar bo fêrxwaz nabête sazandinêkî çemikamêzaney zanyar, her debêtewe xerîkbûn legel çendayetîy zanyar. Em dû corey fêrkarî beradeyekî zor fêrxwaz naçarî lebergirtinewe deken nek têgeyîştin.

<sup>18</sup> Bersaz: manageable. Dekirêt çare bikirêt, deşêt sazî bikeyt û mameley letek bikeyt.

<sup>19</sup> Dakewt: reality (waqî).

<sup>20</sup> Rûkar: aspect, dîw, layen, rwange, goşenîga.

<sup>21</sup> Säljö r. *Lärande i praktiken - ett sociokulturellt perspektiv*. Stockholm. Prisma.

<sup>22</sup> Bestên: context (kontêkst).

- Bestênbend: contextual, babetî bestênbend wate babeteke le bestênî diyarîkirawda seyr dekirêt.
- Bestênbendandin: contextualization.
- Bestênhelweşandin: decontextualization.
- Bestênvebendan: recontextualization.

<sup>23</sup> Lebergirtinewe: reproduction, mebest lêreda kopîkirdin û ziyadkirdinî jimarey heman babete le mêşkî fêrxwazanda.

Binemay ew core fêrkarîyane degerêtewe bo ew boçûney delêt têgeyiştin her xorewt le nawaxinewe peyda debêt. Bo cêhêştinî berpirsayetîy fêrbûnîş delêt mirov her xorisk wehaye: ger berpirsayetî bigirête esto, têgeyiştinî çemikamêz le naxîyewe heldekişêt. Vygotsky boçûnî weha ret dekatewe û delêt têgeyiştinî çemikamêz tenha le dîdarda peyda debêt, dîdarî kesêkî kemtir dezanêt legel kesêkî ziyadtir dezanêt:

*Hem ezmûnî pêdagogî û hem tojînewey bîrdozekî aşkirayan kirdûwe ke bekirdewe fêrkirdinî rastewxoy çemik berşyan nîye û le rûy pêdagogîyewe nezoke. Mamostayekî ew rêbaze degirête ber begîştî le fêrkirdinî wişey vala çî dîke wedest nahênêt, eme wişewazîyekî rûte û xerîkî lasayîkirdinewe<sup>24</sup> û zirewêrandinî<sup>25</sup> bûnî ew çemikaneye lay zarok û le rastîda tenha valayetî penampoş dekat.<sup>26</sup>*

### **Twanistî bîrkirdinewe**

Mebest le bekarhênanî twanistekanî bîrkirdinewe ferahemkirdinî derfete bo mamosta yarmetîy fêrxwaz bidat rûwew “bîrkirdinewey berzepile” *higher-order-thinking*,<sup>27</sup> rûwew têgeyiştinêkî çemikamêz, rûwew şêwazî firecor le “bîrkirdinewey zimanekî”. Twanistî bîrkirdinewe destawêjî çemikamêzin yarmetîman deden pey berîn be şaçemik, nêwerok û saxtarî babet. Vygotsky delêt fêrkirdinî agayane deşêt bibête serçaweyek bo firajûtinî bîrmendane.

### **Nimûneyek le çemikzanî**

Mamostay dîn benyaze kar letek çemiksazî bikat ke yekêke le twanistekanî bîrkirdinewe. Mamosta çemikî “efsane” *myth* dekate serşar û sê rêçkey le pêşe:

- Dawa le fêrxwazan bikat xoyan, le înternêt û kitêbanda, bikewine peydozîy “efsane”.
  - Zorbey fêrxwaz le nêw zeryay înternêt û kitêbanda tenha demênin û tenanet ciyawazîy efsaney zimanî rojane û efsaney çemikî zanistî nabînin.
- Mamosta xoy pênasay zanistaney çemikî efsane be nûsîn/gutin diyarî bikat. “*Efsaney dînekî dastanêke têyda dînî ciyawaz têdekoşin dozî bûn rave biken, bo nimûne gerdûn û mirov çon peyda bûn*”.
  - Mamosta hewil dedat em çemike zanistîye derheste be zimanêkî sakartir, kemtir derhest rave bikat û cudaşî bikatewe le wişeky zimanî rojane. Eme baştîre lew têkelîyey le zor serçaweda dête pêş. Belam hêştî astî derhestbûnî çemikeke lay zorbey fêrxwaz, zêde berze.
- Koşanêkî pitir agayane bo dariştinewey em çemike letek fêrxwazanda. Mamosta derwazey nwê le dozeke dekatewe: “ew diyardeye çîye ke em çemike xerîkî ravekirdinîyetî?”, “mirovî dînnas, ew kesey xerîkî tojîneweye le dîn, be bekarhênanî em çemike mebestî bû çî têbigat?”.

<sup>24</sup> Lasayîkirdinewe: imitation.

<sup>25</sup> Zirewêrandin: simulation.

<sup>26</sup> Vygotsky (1999), p. 256.

<sup>27</sup> Bîrkirdinewey berzepile: higher-order-thinking, wata twanistî zanandin, derikkirdin, piyadekirdin, şirovekarî, têkbestin, nirxandin, dahênan... htd, bepêçewaney “bîrkirdinewey nizimepile” (lower-order-thinking), ke dekatewe zanînî asayî û ezberkirdin.

Mamosta bo fêrxwazanî rûn dekatewe ke mirov le dêrzemanewe xerîkî ramane le serçawe, le mebest û le peydabûnî jîyan. Nimûneş le rwangey dînî ciyawazewe bo fêrxwazan dehênêtewe. Ewca mamosta depirsêt “deysa çi nawêkî hawko bidozînewe gişt em dastanane bigirête xoy ke le dînî corawcorda bas le serçawe, mebest û bûnî mirov û gerdûn deken?”.

Fêrxwaz bedem kar û gftugoy geldestewe degene pênasay çemikî efsane.

- Em mamostaye be şewazêkî agayane û bîrmendane watay çemikekey pêşkeş kird û legel fêrxwazanda serlenewê çemikî dînekîy “efsane” yan dariştewe.

Emyan nimûneyek bû le çemikî ser be dîn, mamostay ziman detwanêt çemikî cênaw bikate kerestey bas, le kîmyada oksîjîn û naytirojîn, le ciyografyada corî çiya, le mêjûda zilhêz, le hunerî nîgarkêşîda çemikî rwange... htd.

### **Bannorîyek le twanistekanî bîrkirdinewe**

Lem baseda yazde twanistî bîrkirdinewe dabeşkirawin beser sê desteda.<sup>28</sup>

Destey yekem, twanistî bîrkirdinewey xawen binemay pêşzimanekîn. Emane birîtîn le:

#### 1) Twanistî sîstemandin<sup>29</sup> û nexşdozî<sup>30</sup>

Rêkxistinî komelêk agadarî û faktî serbe babetêk le saxtarêkî diyarîkirawda. Dozînewey nexş û adgarî hawko le nêwan beşekanî ew agadarî û faktaneda bo dabeşkirdinyan begwêrey sîstemêkî taybet.

Bo nimûne: mamosta, le waney mêjûda, dawa le fêrxwazan dekat her yekeyan rûdawêk tomar bikat ke le mêjûy em pêncsed saleda rûy dawê. Rûdawekan Leser textî pol gird dekirênewe û ewca bo rahêzanî bîrkirdinewey serbe sîstemandin û nexşdozî dekewîne rêkxistin û dabeşînî ew rûdawane begwêrey pêwerî diyarîkirawî wek serdem, buwar, cê... htd.

#### 2) Twanistî giştandin<sup>31</sup> - bo firewandinî mewday sûdwegirtin le ezmûnî xo.

Bo nimûne: bedem karewe derbarey Fransey serdemî fiwdal awir bideynewe le heman serdemî welatî Japon û bikewîne peydozîy serencamî terîb.

Lêreda debêt kêşey watay “giştandin” têbigeyn, çî delêt û çî nalêt. Bo nimûne: “têkray nimrey fêrxwazî gereke zengînekan beriztîre le hî gereke hejarekan”. Car heye mirov giştandinî weha ret dekatewe û barîş heye pena debate ber reşegiştandin (giştandinî zêdero).

#### 3) Twanistî dîtinî akamî berşyan le karêkî mirov deykak.

Bo nimûne le rêy kêşerêjkirdinî ew karewe: çî rû dedat ger gişt mirovî ser zewî rojane xoyan bişorin? Çî rû dedat ger serleberî mirovayetî rojane goştî sûr bixon?

<sup>28</sup> Deste: category, pol, grûp. Destebendî: categorize, destebendkirdin: categorization.

<sup>29</sup> Sîstemandin: systematization, rêkxistin le sîstemda.

<sup>30</sup> Nexşdozî: patterning, dozînewey nexşî hawko, wêney giştî û xetuxalî hawbeş.

<sup>31</sup> Giştandin: generalization, sepandinî boçûnî giştî beser beşî ciyawazda.

4) Twanistî helwêstgirtinî kesekî.

Twanay dakokîye le boçûnî xo bo ewey boçûnekan xuya û berdest bin bo têramanî hem xo û hem kesanî dîke. Fêrxwaz ger pirsyarî lê kira “çon bîrt kirdewe?” debêt fêr bêt çon welam dedatewe.

5) Twanistî bîrkirdinewey rexnegir.

Fêrxwaz twanay hebêt le têkstda “ravekirdin”<sup>32</sup> le “rûnkirdinewe”<sup>33</sup> cuda bikatewe. Twanay hebêt em serdeme û ayende le rwangeyekî mêjûkirdda bibînêt.

Destey dûhem, twanistî bîrkirdinewey xawen binemay zimanekîy aloz. Emane birîtîn le:

6) Twanistî têgeyîştinî kêşey sakarandinî dakewt.

Têbigeyn lewey ew çemik û hêmageley ême bekaryan dehênîn bo peybirdin be dewrûber tenha destawêjin, boxoyan nabine dakewtî rastîne. Dariştinî wêneyek le dakewt, wêneyek le dunyay rastîne, bo nimûne nexşe be nîşanekanîyewe, be asoxulek<sup>34</sup> û stûnxulek<sup>35</sup> yewe, be jimarekanîyewe, destawêje bo derikkirdinî dunyay rastîne, derikkirdinî dakewt, nexşe xoy dakewt nîye.

7) Twanistî hoşgêran le nêwan cûte layenî derhest û berhestda.

Emyan binaxeye bo gişt zanandinêk. Deşêt serederî bêt le sîstemêkî heremîy çemik, bo nimûne le rêzimanda. Yan peybirdin bêt bewey derencamî “boçî-pirsyar” deşêt bersvî hem berhest û hem derhest werbigîrêt, bo nimûne mindal depirsêt “bawegewre boçî mirdûwe?”.

8) Twanistî puxtandin û peybirdin be peyamî babet.

Mirov debêt twanay derikkirdinî serleber (gişte) î basî hebêt û emîş pêşmerce bo têgeyîştinî peyam. Birî zanyar lem serdemeda nêzîkey kotabedere, ger mirov netwanêt serderî le giştîy bas bikat natwanêt sûd le têkstî nûsraw werbigîrêt.

9) Twanistî bekarhênanî çemik û rwangey hemecorî zimanekî wek destawêjî bîrkirdinewe.

Wate mirov têbigat lewey, bo xuyakirdinî layene corawcorekanî diyardeyek, detwanêt çemik û rwangey corawcor bikate destawêj.

10) Twanistî rwangegorkê le cêge û katda.

---

<sup>32</sup> Ravekirdin: description, baskirdin, şîkirdinewe.

<sup>33</sup> Rûnkirdinewe: explanation.

<sup>34</sup> Asoxulek: latitude (parallels), hêlî xeyalkirdî asobare be dewrî nexşey goy zewîda, le xorhelatewe bo xorawa, dekêşîrêt.

<sup>35</sup> Stûnxulek: longitude, hêlî xeyalkirdî stûnbare be dewrî nexşey goy zewîda, le bakûrewe bo başûr, dekêşîrêt.



Wate mirov bitwanêt xoy bixate dunyay kesî dîkewe, bo nimûne hewil bidat le rwangey kesêkî musulmanewe seyrî dewrûber bikat bo ewey pey berêt be bîr û reftarî mirovî musulman. Yan hewil bidat rwangey dayikêkî sedey hevdemî welatêkî diyarîkiraw bigirêt. Mebest ewe nîye dîd û reftarî kesanî dîke bête selimandin, mebest reçawgirtinî helûmercî kat û şwêne.

Destey sêhem, birîtîye le:

11) Twanistî pejrandinî çemikî nwê.

Em twaniste binemaye bo firajûtinî bîrkirdinewe, saxtar be bîrkirdinewe debexşê û helî dekişênêt. Çemik yarîdere bo çalakandinî zanyarî xamoş. Bo nimûne çemikî “hokarî berhembênan” le buwarî “abûrî civakî”-da (ke debête çemikêkî serdest bo çemikî dîkey wek “hêzî kar”, “sermayey cêgîr”<sup>36</sup> û “serçawey siruştî”), derfet bo fêrxwaz ferahem dekat bikewine gftugo derbarey serçawe, bekarbirdinî deramed û mebest le abûrî.

### **Wirdekarîy twanistekanî bîrkirdinewe**

Em twanistaney bîrkirdinewe kirawnete sê deste. Yekemyan ew twanistanen ke peywestî pêvajoy xoriskî hizirîn, wate pêvajoy pêşzimanekî, emane saxtarî hizirîy xorisk dekene binema. Destey dûhem twaniste zimanekîye civakîyekan degraête xo. Twanistî yazdehemîş serbe destey dûheme belam leber ewey lewaney dîke balatire, le destey serbexoda cuda kirawetewe. Ewe twanistî dariştinî çemik û zimanandinî çemike lay mirov derfetî bîrkirdinewey agayaney zimanekî derexsênêt.

Vygotsky delêt bîrkirdinewe û ziman dû serçawey cudayan heye. Serçawey bîrkirdinewe degerêtewe bo milmilanêy mirov legel dewrûberda, bo zîndûman<sup>37</sup> û peley jiyay. Serçawey ziman degerêtewe bo pêwîstîy civakî û sozekîy mirov.

Mirov ber lewey berkewtî legel wişe hebêt, hoş û twanay bîrkirdinewey heye, belam ke em berkewte peyda debêt ewca adgarî bîrkirdinewe dête gorîn. Lewewdûwa çî dî bîrkirdinewe nabête rengdaneweyekî kutumitî dakewt le rêy hestewerekane, belkû be yaremetîy watay wişe, debête rengdaneweyekî giştênirawî dakewt. Mirov ewca, be yaremetîy giştandinêkî wişe deybeşê, bîr dekatewe û bew coreş mewda degirêt lew dakewtey bîrî lê dekatewe.

Vygotsky delêt:

*Here girîngtirînî ême deyzanîn derbarey firajûtinî bîrkirdinewe û ziman lay zarok, eweye ke ew rêçkaney firajûtin, ke zûtir rewtyan cuda bû, le katêkî taybetda, nêzîkey temenî dû salan, yekangîr deben û lewewdûwa wêkra rê deken û debine mayey şewazêkî tewaw nwêy rewîşt, ke taybete be mirov.<sup>38</sup>*

<sup>36</sup> Sermayey cêgîr: fixed capital.

<sup>37</sup> Zîndûman: survive.

<sup>38</sup> Vygotsky (1981), (1999).

## **Destey yekem, twanistî bîrkirdinewey xawen binemay pêşzimanekî (1-5)**

Mirov ber le geyîştin be twanay zimanî zarekî, yadewerî<sup>39</sup> heye û ezmûn peyda dekat. Em yadewerîyane kutumit û rastewxon, le pênc hestewerekanewe werdegîrên û karîgerîy behêzyan heye hem destîpêk û hem ayende.

Pênc hestewerekan beşî têkbesten le nêw mirovî jînwerda û ewey destbecê lew hesteweranewe be mirov degat destbecê debête beşêkî têkbestey ew mirove - eme cudaye lew ezmûne hêmakarey wêne, wişe û jimare deybexşin, ewane hêman û mirov debêt le rêy zimanewe sazusewdayan letek bikat ber lewey lêkbidirênewe û bikirêne babetî berdek. Paş em firajûtine zimanekîye ewca ezmûnî hêmakarîş têkdebistirên û debine beşêk le mirov.

Bûn û nebûnî yadewerî û ezmûnî rastewxo lay mirov, karîgerîy mezinî heye leser bîrkirdinewe û bekarhênanî saxtarî hizirî. Em base hem nihomî pêşzimanekî degirêtewe û hem nihomî agayaney zimanekî. Mirov her dayikza pêşmercî hizirîy heye bo sazandinî ew yadewerî û ezmûngele. Ewca zimanî zarekî dête pena û debête destawêjêkî dîke bo sazandinî dewrûber. Peydabûnî twanistî zimanekî nabête mayey xamoşbûnî twanay sazandinî yadewerî û ezmûngelî pêşzimanekî, emane her demênin û debine hander bo, yan rêbest le, sazandinî zimanekîy dewrûber.

Saxtarî hizirîy pêşzimanekî paş geşekirdinî zimanîş lay mirov her demênin û peywendîy pitew le nêwan herdû core twanistda peyda debêt. Twanistgelî zimanekî hêz û tîn le twanistgelî pêşzimanekîyewe degirin. Leber eweşe fêrge debêt kar letek herdû coryan bikat, hem pêşzimanekî û hem zimanekî.

Zarokî biçûk detwanêt dewreber “saxtarbend” bikat, dayik le kesî dîkey na-dayik cuda bikatewe, “nexş” le dewrûberî xoyda bibînêt û binasêtewe, be gwêrey binemay corawcor kala “polên” bikat. Zarok fêr debêt ke reftarî ciyawaz rengdanewey ciyawaz lay dewrûber peyda dekat, kewate reftarî ciyawaz “akam”-î ciyawazî lê dekewêtewe. Ewe tenha kurthênanî twanistî bizawtin<sup>40</sup> nîye zarok xwardin û xwardinewe derêjêt. Beşêkî peyweste be “saxtarbendî” û “giştandin”-î ezmûnekanî xoy û akamî ew ezmûnane. Ew pendey delêt: “zarokî daçzaw le agir beperêze” corêke le giştandin.

Cextkirdinî fêrge leser herdû corî saxtarî hizirî, hem pêşzimanekî û hem zimankî debête koşanêk bo têkbestinî ew saxtare hizirîye mirovkirde mêjûkirde letek ew pêwîste dayikzaye û twaniste xoriske dayikzayey mirov heyetî bo saxtardozî.

### **1) Twanistî sîstemandin û nexşdozî**

Le buwarî sîstemandin û nexşdozîda Arîsto (Arîstoteles - Aristotle) debête pêşengî mezin û binaxerêjî hizirî xorawa. Ew hizirey xerîkî saxtar, saziman, dabeşîn û destebendîye. Lem buwareda Swêd-îş şanawî xoy heye: Carl von Linné.

Mirov bo derikkirdinî babet û diyardey hemecor le dewrûberda nexşî taybet degirête ber. Mirov dekewête saxtarbendî, destebendî û cudakirdinewe, xerîkî dozînewey nexşî hawko debêt - nexşdozî... Deşêt em core bîrkirdinewey be “bîrkirdinewey saxtardoz” nawdêr bikeyn.

---

<sup>39</sup> Yadewerî: experience, le zimanekanî skandînavyada çemikî “*upplevelse*” heye bo beserehat û serburdey taybet, xoş yan naxoş, ke debine yadewerî û ezmûn û le hoş û derûnî mirovda cêgîr debin. Lêreda yadewerî beranber danirawe heta çemikêkî baştir peyda debêt.

<sup>40</sup> Twanistî bizawtin: motor skills.

Vygotsky, bedem ravekirdinî firajûtinî çemikzanîy lay zarok, hêzî em pêvajoy saxtardozi û nexşdoziye rûn dekatewe. Zarok le seretada dewrûber le çemikî katîda gîr dekat û paşan derbaz debêt bo rêkxistinî çemikî aloz le saxtarî pitir damezirawî çemikda. Ewca bedem katewe, em çemike alozane, ziyadtir û ziyadtir, wêkiçûy çemikî mirovkirdî pejrêniraw debin.

Ême debêt agadarbîn lewey em saxtargele mirovkirdey zanyar û têgeyiştin, beradeyekî zor karîger û biryardere lewey mirov çon pey be dewrûber debat. Emane binaxey cîhanbînîy ême daderêjin. Em saxtargele mirovkirde dawstaw nîn, bedem katewe dêne gorîn, belam her hen. Mêjûy mirovayeti çendîn saxtarî civakîy corawcorî hênawete berhem, beşêk le karkirdyan ragirtinî şîrazey guzeran bûwe. Lewe deçêt pêwîstîy saxtarbendkirdinî guzeran lay mirov, pêwîstîyekî cêgîr û dawestaw bêt, belam aşkiraye ke şêwaz û corî derbirîn lew pêwîstîye bergore (dête gorîn).

Nimûney karî pol: mamosta penca wişey diyarî dekat û dawa le fêrxwaz dekat be pê pêwerêkî biryardey xoyan em wişane polên biken. Bo nimûne: pîtî yekem, jimarey pît, jimarey birge. Yan cudakirdinewey “wişey kirdin” (bo nimûne: barkirdin, rakirdin, sazirdin) û “wişey kelûpel” (bo nimûne: pênûs, kaxez, kitêb). Bem kare destebendî û polênî firecor dêne berhem. Paş gftugoy nêw pol, mamosta arasteyan dekat bo dozînewey xalî hawbeş le nêwan bîrkirdinewey û cudakirdinewey xoriskaney xoyan le layek û polênî ferhengza û zanyarbêj - ke lêreda dekatewe “corî wişey” - le layek. Girînge mamosta bo fêrxwazanî rûn bikatewe ke em dabeşîne ferhengîye damezirawe, rêkewtine, pêkhatine, biryare û deşêt bête gorîn. Zanîni em rastîye debête yarîder bo welamdanewey pirsyarî wek: “to delêyt Osyana<sup>41</sup> (Okiyânûsya) kîşwere<sup>42</sup> belam bawkim delêt Awsturalya (Australia) kîşwere”.

## 2) Twanistî giştandin

Giştandinîş wek twanist rîşey pêşzimanekî heye. Zarokî biçûk bo ewey baştir letek dewrûberda hel bikat pena debate ber giştandinî ezmûn û yadewerîy xoy. Zarok detwanêt sûd le ezmûnî zûtir werbigirêt. Belam beşêk lew ezmûngele berayîye pêşzimanekîye nakoje newe û her demênin, debine corêk le “zêdegiştandinî pêşzimanekî”.

Ezmûnî pêşzimanekî her demênin û le zor rûwewe behêztir lew ezmûngele zimanekîyey paşan mirov tûşyan dêt, têkbestey mirov debin. Ezmûngelî pêşzimanekî rastewxo le pênc hestewerekewe dêne henawiman, herçî zimanekîye le rêy hêmawe, le rêy wişey, wêne û jimarewe pêman degen. Em beşey dakewt ke hêmakirde, debête ezmûnî dûredest, hêmakan dekewine nêwan ême û dakewtewe. Em kêşekarîyey le ezmûnî pêşzimanekîyewe peyda debêt, le derûnşîkarîda<sup>43</sup> be yarmetîy çemikî “agayî”<sup>44</sup> û “nest / agayî win”<sup>45</sup> dête berbas. “Zêdegiştandinî”-î pêşzimanekî laman mawe û karîgerî leser nestiman heye.

<sup>41</sup> Osyanya: oceania. Okiyânûsya.

<sup>42</sup> Kîşwer: continent, parzemîn. Le zimanî swêdîda dû çemikî ciyawaz heye, yekem “*världsdel*” mebest lêy parçe zemînî weha hem le rûy ferheng û mêjûwewe û hem le rûy ciyografîyewe cudan. Emyan mirovkirde û lewaneyey “kîşwer”-î bo baş bêt. Dûhemyan “*continent*” û mebest lêy parçe zemînî tenha le rûy ciyografîyewe cuda. Emyan siruştkirde û lewaneyey “parzemîn” -î bo baş bêt. Le îngilîzîda bo herdûkiyan tenha “*continent*” heye. Bo nimûne: Asya û Ewrûpa dû kîşwerî cudan belam yek parzemînî û pêy degutirêt Ewrasya (Aurasia), çünke le rûy ciyografîyewe têkbesten.

<sup>43</sup> Derûnşîkarî: psychoanalysis.

<sup>44</sup> Agayî: conscious.

<sup>45</sup> Nest: unconscious., hoşî win, agayî win.

Twanistî giştandin pêşmercêke bo ewey mirov bitwanêt agayane û zimanekîyane xerîkî zanyar û ezmûn bêt. Tenanet derbirîne here sakarekanî zimanekî, wek dirext, xanû, dûçerxe le rastîda le rûy zimanewe, derhestandinin. Fêrkarî debêt cexit Leser rûnkirdinewey em hevbendîye bikat bo ewey fêrxwaz lêy beaga bin. Mamosta dawa le fêrxwazan dekat her yekeyan bîr le “dirext”-êk bikatewe. Paş maweyek le gftugoy nêw pol rûn debêtewe ke gişt poleke bîr le heman dirext nakatewe, her fêrxwazêk bîr le dirextêkî taybet be xoy dekatewe. Fêrxwaz têdegen lewey çemikî dirext jimareyekî nêzîke nakotay dirext degirêtewe û mirov xoy, le rêy ezmûnî xoyewe, dirextî xoy le hoşî xoyda deafirênêt.

Mamosta be karî weha detwanêt derfet bidate fêrxwaz hevbendîy nêwan hêmay zimanekî û dakewt pêşan biden û têbigen ke hêmay zimanekî birîtîye le pêkhatin. A lêreda hem hêz û hem lawazîy sazandinî zimanekî bo fêrxwaz xuya debêt.

Mirov le giştandinda debêt twana bêt xalî yekta<sup>46</sup> le xalî giştî cuda bikatewe, bizanêt ew giştandine çî delêt û çî nalêt. Fêrxwaz boyan rûn debêtewe ke ezmûnî kesekîy taybetî xoyan, bo nimûne le basî direxta, merc nîye hawko hemû poleke bêt belam wêray eweş layenî hawko hen lew çemikeda gird debinewe.

Lem serdemeda meylêkî baw heye bo cexitkirdin Leser layenî yektaî û piştîkirdine giştayetî. Emeş zor seyr nîye çünke le rastîda hemû kesêk bo xoy yektaye. Leweş deçêt em diyardeye bertekêkî postmodêrnane bêt beranber zanyarbînî serbe projey hawçerxandin (modêrnîtê) ke rîşey degerêtewe bo serdemî Roşingerî (Renaissance). Sazandinî zanyar çî beser dêt ger yektaî cêy giştayetî bigirêtewe, yan sozayetî û sosegirî<sup>47</sup> beranber bîrkirdinewey hoşekî ragîrên. Raste mirov bertawî sozayetî û sosegirîye, remek û helpe<sup>48</sup> debine handerî reftarî wî belam projey ferhengîy mirov daway hoşmendî û awezmendîyş deken. Endamî nwê ke dête civakewe, bo helkirdin letek projey ferhengîda ke rêk dekatewe civak, naçare xerîkî firajûtinî twanistî bîrkirdinewey hoşekî û rexnegir bêt.

Mêjû nimûney zore le derhawîştay doxêkî hoş û awez têyda meydan bo soz û helpe çol biken. Pol debêt derfet birexsênêt bo kobûnewey hest, soz, remek û helpe legel pêwîstîy ferhengîy mirov bo hoş û awez. Civkasazî xebate le nêwan hoşekî û nahoşekîda. Herdû layenîş debêt le polda cêgeyan hebêt. Le waney dînda bo nimûne dekirêt bas le xale yektayekanî dînêkî taybet bikeyt, belam deşkirêt bikewîne peydozîy hawşêwe û hawcorî ew taybetmendîyane lay dînî dîke, beweş layenî giştandin beser dekeynewe.

Vygotsky delêt dozînewey wêkiçûn berokgîrîyekî hoşekîy sextitire le dozînewey cudawazî - mirov cudawazî hasantir debînêt wek le wêkiçûn. Zarok zûtir derik be cudawazî deken û direngtir be wêkiçûn. Ravey bîrdozekî em diyardeye delêt hevbendîy wêkiçûn aloztirin û pêwîstyan be çemikî serdeste ke pitir derhestin. Mirov, bo nimûne, behasanî cudawazîy nêwan sî kalay cuda debînêt belam ger berawirdî helkişawtir mebest bêt ewa pêwîstiman be çemikî serdestî wek reng, şêwe, endaze, karkird... htd debêt.

### 3) Twanistî dîtinî akamî berşyan le karêkî mirov deykat

Twanistî dîtinî akamî berşyan le karêkî mirov deykat, her wek dû twanistekey zûtir basyan hat, beranberî heye le saxtarî hizirîy pêşzimanekîda. Adgarî wêne pêşzimanekîyekey em twaniste birîtîye le akamî demudest. Giyandarî şîreder, be mirovî pêşzimanekîşewe, karêk dekat û demudest

<sup>46</sup> Yekta: unique, tak, taybet, bêmanend.

<sup>47</sup> Sose: intuition, sosey derûn.

<sup>48</sup> Helpe: impulse.

akamekey werdegirêt. Paşan, ke jûrxanî zimanekî peyda debêt, ewca mirov destawêjî debêt bo sazandinêkî pitir agayaney ezmûn. Mirov detwanêt guzeranî xoy planrêj bikat, akamî corawcor bibînêt û deştwanêt dabînkirdinî pêwîstîyekanî xoy be corêk dûwa bixat ke giyanewerî dîke naytwanin.

Giryanî zarok lewaneye bertek bêt le rûdanêk, belam dûrîş nîye ziregiryan bêt bo rakêşanî serinc. Lewe deçêt pêwîstî, wîst û twanistî mirov bo cilewgirtinî dewrûber besterî behêzî be saxtarî pêşzimankîyewe hebêt.

Em base le “bîrdozey dine”<sup>49</sup> -y Sigmund Freud-da debête şabas. Diney wek birsyetî û tînwetî debêt dabîn bikirîn dena mirov demirêt. Diney zayend dekirêt dûwa bixirêt bo katî dîke û şewazî derbirînî dîke bigirêt xo (helkişan).<sup>50</sup> Em wizeyeş le projey ferhengîda dexirête kar. Hemû şewazêkî civakîy nasiraw hewilî dawê sûd werbigirêt le wizey zayendekî be mebestî civakandinî<sup>51</sup> mirov be arasteyekî diyarîkiraw.

Sazandinî zimanekî bo akamekanî reftarî mirovkird hêzêkî nwê dedate em twaniste. Le ast takekesda, derfet dedate mirov hoşekîyane sazusewda letek ayendey dûrmewday xoy bikat. Le ast civakda, derfet derexsênêt bo sazusewday agayane û hoşekîyane letek amancî dûrmewda ke dekatewe firajûtinî civak.

Em twanistî akambînîne hem hevbendî û hem datirazanî<sup>52</sup> dû layenî xwastî têgeyiştinî civak û xwastî gorînî civak be rûnî xuya dekat. Tojînewe hen xerîkî ravekirdinî dunyan, tojînewey dîke hen xerîkî hem ravekirdin û hem rûnkirdinewen, destey sêhemîş hen xerîkî ravekirdin, rûnkirdinewe û ewca gorînî. Bo nimûne birwane Dananekîyetî,<sup>53</sup> Hermentutîk<sup>54</sup> û Marksayetî (Marksîzim - Marxism).

Deysa em twanistî dîtinî akamî berşyan le reftarî mirovkird çon le fêrgeda çare bikirêt? Le şababetî bo nimûne mirov û “civakî xoragir”-da, pirsyarî lem core debine bizwêner: çî rû dedat ger gişt mirovî serzemîn rojane xoyan bişon? Çî rû dedat ger gişt mirovî serzemîn rojane gerok (automobîl) bajon? Çî rû dedat ger... htd. Pirsyarî lem core debine berokgîrî ew serşare kesekîyey fêrxwaz heyetî, pêşanî deden akam çî debêt ger ew pêwîstîyaney fêrxwaz be mercî degirêt, bibête mafêkî giştî bo hemwan.

Le waney civaknasîda dozî nakokîy nêwan boçûnî tak û berjewendîy civak dête berbas. Babetî wek: giyanewerparêzî,<sup>55</sup> lafermanîy<sup>56</sup> laşer<sup>57</sup> (lafermanîy sîvîl, medenî) û diyardey dîkey civakî ke debine mayey kêşerêjkirdinî biryarî dêmokratyane girînge le fêrkarîda cêyan hebêt. Erkî fêrge lêreda

---

<sup>49</sup> Bîrdozey dine: Drive theory, theory of drives. Bo “dine” beranber drive, birwane Celizade (*Zarawesazîy pêwane*).

<sup>50</sup> Helkişan: sublimation, le derûnnasîda debête rûgorînî diney jînewerîy wek zayend le amance demudestekey xoyewe berew amancêkî dîkey ptir pesendkirawî civakî û ferhengî.

<sup>51</sup> Civak: society, civakî: social, civakandin: socialization.

<sup>52</sup> Datirazan: distinction, lêk helbiran, cudakirdinewe, cudawazî.

<sup>53</sup> Dananekîyetî: positivism. Nawe bo rişte felsefîyaney delên le civaknasîşda, her wek le siruştinasîda bawe, debêt fakt (rastîne) bibête binemay zanyar. Derencamî tojînewey ezmûnekî debête binema bo helbestinî zanyar. Ewey berpêwan û berkêşane debête binema, ewey dîke kemtir girînge. Bo çemikî dananekîyetî birwane Celizade (*Zarawesazîy pêwane*).

<sup>54</sup> Hermentutîk: Hermeneutics. Zanistî lêkdanewey nûşyar, hunerî têgeyiştin û peybirdin. Rîşey em çemike degerêtewe bo wişey “*Hermēneuō*” y Yonanî dêrîn, be watay lêkdanewe û terceme û lewîşewe bo “*hermeneus*” be watay lêkderewe û tercuman ke degerênewe bo “*Hermes*” -î peyamberî xudawend le efsaney yonanîda, ewey peyamî aloz û penampoşî xudawendî terceme dekird bo ewey mirov têyan bigat.

<sup>55</sup> Giyanewerparêzî: animal rights movement, bizavî parastin û dakokî le mafî giyaneweran.

<sup>56</sup> Lafermanî: disobedience, nafermanî, yaxîbûn, serkêşî, serpêçî. Birwane Celizade (*Zarawesazîy pêwane*).

<sup>57</sup> Laşer: nonviolent, peaceful. Birwane Celizade (*Zarawesazîy pêwane*).

rexsandinî derfete bo fêrxwaz boçûnî xoyan derbirin nek bibine layengirî em yan ew boçûne. Sêrey mamosta debêt Leser şewazî derbirîn û dariştinî pirsyar bêt lay fêrxwaz.

Ger hate ser çemikî dêmokrasî, girînge şewazî fermanrewayî dêmokrat cuda bikeyenewe le basî takî dêmokrat. Le perwerdey dêmokratda cexitkirdin Leser taybetmendîy mirovî dêmokrat girîngtîre le baskirdinî fermanrewayîyekî diyarîkirawî dêmokrat.

#### 4) Twanistî helwêstgirtinî kesekî

Zirîkey zarokî biçûk corêke le helwêstgîrî, le pêşandanî pêdagîrî û le xwast, daway pejrاندine, dîtin û lêbîstine. Boye em twanisteş rîşey le pêşzimanekîda heye. Helwêstgirtinî mirov twanayeke xawen binaxey qûl û fêrkarî debêt hander bêt bo geşekirdinî em twaniste. Fêrge zemîne ferahem dekat, saxtar û rêçke diyarî dekat bo ewey fêrxwaz twanay hebêt şewey lebar bidozêtewe bo helwêstgîrî.

Zarokî biçûk yeknewazane larî yan layengirîy xoy denwênêt beranber diyardeyek. Dunya beser spî û reşda dabeş dekat. Le ast pirsyarî dijwarda çawerêy welamî sakare. Lemêje dastanî gelêr pey birdûwe bem core bîrkirdineweyey zarok. Dastan sûd lem bîrkirdinewe cûtcemserey çak û bed, rast û çewt, spî û reş... werdegirêt. Dastan bem core rêy civakandinî zarok xoş dekat, bîrkirdinewey zarok dekate serşar û ewca hestî debizêwêt û lewîşewe xeyalî dehrûjênêt rûwew firajûtinî bîrkirdinewey afirêner.

Fêrge debêt piştîwanî le fêrxwaz bikat bo helwêstgîrî û raderbirîn, tenanet ger ew helwêst û boçûne le dîdî civakî emroşda kemtir pesend bêt. Ewca rûkarî zimanekî girînge. Mirov tenha be derbirîn detwanêt bîr û boçûn û helwêstî xoy xuya bikat. Firajûtinî ziman debête hoy xuyabûnî dîd û helwêst hem bo xo û hem bo ewaney dîke û beweş derfetî baştir derexsêt bo fêrxwaz dakokî le boçûn û helwêstî xoy bikat. Erkî fêrge firewandinî bîrkirdinewey fêrxwaze nek sepandinî ew bîrkirdineweyey lay mamosta “dirust”-e.

#### 5) Twanistî bîrkirdinewey rexnegir

Helwêstî rexnegir le diyardekanî dewrûber stratîjêkî dayikzaye bo mirov mawetewe. Zarokî şîrexor hemû şitêkî tift detfênêtewe. Dûr nîye rîşey em reftare bigerêtewe bo ewey rûwekî jehrîn le siruştada begîştî tiftin. Zarok ger ezmûnêkî tirsinakî legel şordin hebêt, şordinî pêyxos nabêt. Helwêstî rexnegir le aw degirêt. Emane nimûnen le twanistî rexnegir le astî pêşzimanekîda.

Le wêne pêşzimanekîyekey em twanisteda corêk le giştandinî hoşneyar<sup>58</sup> heye û tenanet paş firajûtinî zimanîş her demênêt. Ême debênîn çon tirs wirey mirov pek dexat, eme nimûneye lewey ezmûn heye mirov natwanêt be şeweyekî hoşekî çarey bikat û em core ezmûngele tawî mezinyan heye. Her em layene hestekî û hoşneyareye bazar le rîkilamda bekarî dehênêt bo xoşkirdinî xercemenî. Bazar dezanêt hest cudaye û behêztirîşe le bîrkirdinewey awezmend.

Îsta dezanîn mirov yadewerîy xoy le rêgey hem hestekî û hem hoşekîyewe çare dekat û girînge fêrge xerîkî firajûtinî em twaniste rexnegere bêt lay fêrxwaz. Fêrxwaz debêt twanay hebêt agayane layenî hoşneyaraney xoy rûmal û derik bikat. Leweş bitirazêt girînge fêrxwaz bibête xawen destawêjî lebar bo peybirdin bew hewilaney le dewrûberda dedirên bemebestî dagîrkirdinî hestî mirov û firîwdanî mirov rûwew helwêstgîrî û biryardanî hoşneyarane.

---

<sup>58</sup> Hoşneyar: irrational. Birwane Celizade (*Zarawesazîy pêwane*).

Hest û awez hevbendîyekî diyalektîkaneyan heye. Yadewerî û ezmûnî pêşzimanekî karîgerî heye leser koşanî mirov bo çaredozîy awezmend û hoşekî. Sazandinî awezmend, hoşekî û rexnegir debine yarîder bo derikkirdinî yadewerî û ezmûnî pêşzimanekî.

Em hevbendîyey hest û awez rehendî dîkeşî hen serbe civak û siyasetin. Feylesûfanî serdemî Roşingerî cexityan leser awezmendîy mirov û firajûtinî mirovî awezmend bû. Carûbarîş zêderoyî kirawe le bawer be awezmendî û çawenor bû awezî hoşekî cilewî layenî hoşneyar bigirêt. Belam mêjû nimûney zore le reftarî em mirove awezmende. Gelekujîy serdemî dûhem cengî cîhanî le civakêkî jiyarmendî balada çon rûn bikeynewe? Ew hejende berhemî awez nebû. Lem rojgareşda debînîn rewî wek binemagerî çon birew peyda deken.

Bîrkirdinewey rexnegir girînge û fêrge lem buwareda debêt rizgarker bêt. Wate mamosta, be dabînkirdinî destawêjî zimanekî û hizirîy pêwîst, derfet bo azadkirdinî twanistî rexnegerî fêrxwaz ferahem bikat. Lêreda hunerî pirsyarkirdinî mamosta şadoze. Pirsyarî mamostaye derwazey bîrkirdinewe berûy fêrxwazda dekatewe. Fêrkarîyek cexitî tenha leser pirsyarî serbe kontirolkirdinî fakt bêt, nabête xwêndinêkî rizgarker.

Pirsyarî wek: “sîstemî xoşguzeranîy Swêd çon helbestirawe?” nabête pirsyarî rizgarker, çi derfetêk bo bîrkirdinewe û helwêstgîrîy rexnegir narexsênêt. Pirsyarî dîke heye lem buwareda derwazey raman û rexne baştir dekenewe, bo nimûne: pêt waye em sîstemî xoşguzeranîye gişt kesêk degirêtewe? Pêt waye dahatî bac le ayendeda twana bêt xercîy em sîstemî xoşguzeranîye biçerxênêt? Pirsyarî corawcor derwazey bîrkirdinewey corawcor dekenewe.

### **Destey dûhem, twanistî bîrkirdinewey xawen binemay zimanekîy aloz (6-10)**

Heta êsta bas lew tunastgele bûwe ke pêman waye rîşey pêşzimanekiyan heye. Mebest eweye em twanistane wêneyan le saxtarî hizirîy pêşzimanekîda heye û lewêşewe wize degirin. Em saxtarane hênd bineretîn ke begîştî cuda nakirênewe le saxtargelî şîrderekan. Em saxtare hiziriyane serçawen bo ew destawêje berayîye hawkoyey mirov û şîrderekan pêwîstin bo helkirdin le siruştada û rêk leber emeşe, paş wergirtinî rehendî zimanekî, hêzî hênde mezin peyda deken.

Lem beşeda pênc twanistî dîke dêne berbas ke besterî rûnyan le saxtarî pêşzimanekîda nîye. Emane binemay aloztiryan heye, binemay hem serbe saxtarî hizirîy berayî, hem serbe saxtarî awezmendaney zimanekî ke zimanî hêmakar pêşmercî bo dariştûwe. Be çerxandinî em twanistane, dekewîne cîhanîkewe hoşzade û mirovkird, besterî rûnî legel dewrûberda nîye. Em twanistane lay zarokî pêşzimanekî rengiyan nîye. Pêşiman wehayê lay civakî bêsewad, wate civakêk zimanî nûsînî nebêt, tenha zimanî zarekî têyda binema bêt, firajûtinî em twanistane dijware. Ewe sewad û zimanî nûsîne, be twanay mewdagîrîyewe, debête ew firajûtiney pêwîste bo peydabûnî em twanistgele.

### **6) Twanistî têgeyîştinî kêşey sakarandinî dakewt**

Peywendîy mirov û dewrûber, ke dekatewe peywendî letek “dakewt”-da, basêkî çire û hezaran sale mayey peroşîy mirove. Seretay em base raveyekî giştîye derbarey dîdî corawcor le makî dakewt. Paşan koşanî mirov bo sakarandinî em dakewte - be mebestî derikkirdinî - dête berbas. Ewca le kotada awir lew dozgele dedeynewe ke debine zadey em sakarandine.

Makî dakewt ew kate debête dozêkî felsefî ke mirov twanay hebêt be yarmetîy ziman le dakewt ramênêt. Rêk em core têramaneyê, têramanî mirov be destawêjî zimanî hêmakarewe, derfet derexsênêt bo mewdagîrî le dakewt û bîrkirdinewe lêy. Ziman peyda debêt û mirovî zimanekî dekewête dariştinî pirsyarî wek: dakewt çîye? Ême detwanîn çî le bareyewe bizanîn? Çon detwanîn pey be dakewt bibeyn? Emane nimûnen lew pirsyare katbederaney lemêje mirov peroşî welamdozîyane.

Bîrmend hen delên dakewt beder le bûnî mirov bûnî nîye, bîrmendî dîke hen pêdagirin leser bûnî mirovbederî dakewt. Ew ramaney delêt dakewtî mirovbeder bûnî nîye, amajeyê be seng û hêzî ziman. Lêreda ziman debête besterêk le nêwan mirov û dakewtda. Ewca derfetîş saz debêt bo ewey be yarmetîy ziman hewil bideyn karîgerîman hebêt leser dakewt.

Tojînewey serbe mirovnaşî<sup>59</sup> hen pêşanî deden çon peyiv (wişe) le nêw ferhengî tewaw zarekîda (gelanî siruştînişîn) wizey taradeyek cadûbar (şîhrî) peyda deken. Mirov bawerî heye bewey ger giyanewerêk nawdêr bikat ewa hem zal debêt beserîda û hem hêzî lê werdegirêt. Le bestênî dînda bawe ke peyiv watay cadûbar werbigirin, destpêkî Încîlî Yuhenna delêt: “sereta peyiv hebû, peyivîş lay Xuda bû, peyiv Xuda bû”. Le “Sereta”-da<sup>60</sup> Xuda dête go, debêjêt: “... «rûnakî dirust bibe!» û rûnakî dirust bû. Xuda dîtî rûnakî başe û rûnakî le tarîkî cuda kirdewe. Xuda rûnakî be roj nawdêr kird û tarîkî naw na şew”. Peyivekanî Xuda pêş dakewt dekewin. Weha dête ranwandin ke Xuda be yarmetî peyiv dunya deafirênêt. Hêzî cadûgeraney peyiv zorukem le guzeranî rojaney mirovda reng dedatewe. Mirov le naxî xoyda be bêdengî wişe bekar dehênêt bo dirustkirdinî karîgerî leser dewrûber.

Mirov bo peybirdin be dewrûber çendîn stratîj bekar dehênêt, yek lewan sakarandinî dakewte, bo nimûne beyarmetîy nexşe. Hawkat debêt bizanîn ke em sakarandiney dakewt dekatewe gorînê ew dakewte. Mirov lem sakarandineda kam rûkar lew dakewtda xoy be girîngî dezanêt repêşî dexat û kam rûkar belayewe lem bestêneda kemtir girînge wêlî dekat. Bem kare degutirêt “pêvajoy derhestandin” - dakewt têyda le astêkî pitir derhestda dête pêşkeşkirdin. Nexşe dakewt nîye, derhestandine le dakewt belam seyr lewedaye ke yarmetîman dedat bo ewey hasantir serederî le dewrûber bikeyn. Lêreda rûn debêtewe çon nexşe debête besterêkî nêwan mirov û dakewt.

Be heman şêwe çemikî zimanekî, modêl û bîrdoze dekewine nêwan mirov û dakewtewe û her bew coreş debine yarîder bo hoşederî le dewrûber. Çemikî zimanekî, modêl û bîrdoze zadey bîrkirdinewey mirovn. Emane berhemî hizirzan, le bîrkirdinewey mirovkarda debine destawêj bo hoşederî le dakewt. Belam hawkat deşbine sinûrkêşî bîrkirdinewe û çêwerêjî serederîman le dewrûber. Em çemik, bîrdoze û modêlane, her leber ewey hizirzan, xawen behay hem ravekarin (zor yan kem) û hem serederî (baştir yan xiraptir). Ewca mewdaşyan le dakewtewe dûr û nêzîkî heye.

Mirov bo nimûne bebê nexşe, rêy dekewête daristan yan şarêkî zûtir şarezay nîye û bo serederî û rewderikirdin hewil dedat saxtarêkî hizirza beyarmetî tûlerê, corî dirext, çem, gird, yan balexane, pird, kûçe û bazar darêjêt. Em mirove hewil dedat nexşeyekî hizirza darêjêt û wek destawêjêkî sakarandin bekarî bihênêt bo serederî lew dewrûberêy têydaye. Em mirove تنها hoş û serincdanî

<sup>59</sup> Mirovnaşî: anthropology, antiropolojî.

<sup>60</sup> Sereta, yekem beşe le pênc beşekey Tewrat ke birîtîn le:

1. Bereshit/Genesis/Sereta
2. Shemot/Exodus/Korew
3. Vayikra/Leviticus/Lawîname
4. Bamidbar/Numbers/Jimardin
5. Devarim/Deuteronomy/Yasay dûhem



xoy, wêne, wişê û bîrî naxekîy xoy bekar dehênêt bo rewderikirdin. Em sakarandiney dakewt kêşeamêze.

Deysa peybirdin bem kêşeye, kêşey sakarandin û derhestandinî dakewt, watay çîye? Bekurtî watay eweye mirov agadar bêl lewey em sakarandine çî karêk be dakewt dekat û ewca çî karîgerîyekî heye leser ême û bîrkirdineweman. Lem serdemeda “mewda”-î nêwan mirov û em dakewte aloze fire berîne boye twanistî derikkirdinî kêşey sakarandin girînge bo sazandinî zanyar.

Le fêrkarîda pêwîste pey berîn bewey çî le mêşkî fêrxwazda deguzerêt, çon bîr dekatewe û çî twanistêkî heye bo têgeyîştin lew wêne sakarandiney dakewt ke rojane le axaftin û nûsînda tûşyan dêt. Em twanistî derikkirdinî kêşey sakarandine, mirov debate dunyay ziman û awezewe, dunyay dûr le dakewt. Lêreda sêre leser hêmagelî hizirzaye û benaçarekî dekewine nêwan mirov û dakewtewe. Sazandinî çemikamêzaney zanyar dawa le mirov dekat pey berêt be peywendîy em hêmagele, hem be mirovekewe û hem be dakewtekeyewe.

Em kêşey derikkirdinî hêmagele basêkî girînge û le gişt sazandinêkî bîrkaraneda xuyaye. Fêrge detwanêt bibête yarîder bo firajûtinî twanistî mirov bo helkirdin legel em kêşeyeda. Fêrxwaz ger em twaniste peyda bikat û pey be kêşey sakarandin berêt, le buwarî awezmenîda hasantir dekewête afirandin.

## 7) Twanistî hoşgêran le nêwan cûte layenî derhest û berhestda

Lewaneye girîngtirîn karkirdî zimanî helkişîw birîtî bêl lewey bibête destawêj lay mirov bo ravekirdinî cîhan û peybirdin be dakewt. Firajûtinî ziman bote mayey heremandinî<sup>61</sup> peyiv, binemayekî giştîy firajûtinîş bote mayey ziyadbûnî çemikî derhest, yan helkişanî derhestbûnî çemik. Astî derhestanî peyiv, wate peyiveke çî û çend degirête xo, herdem le gorankarîdaye û serbarî eweş astekanî derhestandinîş ziyad debin.

Vygotsky delêt firajûtinî ziman dû rewî heye be dû arastey cuda, yek rûwew astêkî balatirî derhestandin û yek rûwe astêkî derhestandinî nizimtir, rûwe pitir berhestandin.<sup>62</sup> Çemikî “dirext” be nimûne bigire, lewe deçêt sereta çemikêk bûbêt bo herçî pêy degutirêt dirext. Paşan çemikî wek dirextî pelkderzî<sup>63</sup> û dirextî pelkpan<sup>64</sup> y lê peyda debin. Ewca çemikî dirextî pelkpan defirajêt û spîdar (xûşe) û darberû... htd degirête xo. Em kare dewamey heye û spîdar çemikî dîke lê dekewêtewe û rweknasan her xerîkî polênkarî û çemikandinin.

Hawterîbî em rewtey be lêjarî<sup>65</sup> çemikandinda rûwew pitir berhestandin, rewtekî dîke heye rûwew berzarî<sup>66</sup> çemikandinda. Wişey dirext ke le seretada berejêr amaje bûwe be dirextî berhestî diyarîkiraw, rûwew hewrazîş geşe dekat û amajey berejûrî debêt. Dirext debête beşêk le çemikî pitir serdest û derhestî wek “rwek”, “jînewer” û “siruşt” - û balatirîş derwat û dête buwarî mêtarewe. Kewate em “dirext”-ey sereta çemikêkî berhest bû, bedem rewî firajûtinî zimanewe rû le derhestandin dekat û hawkat wênegelî berhestî ziyadtir le jêr xoyda rîz dekatewe.

<sup>61</sup> Herem: hierarchy. Heremandin: hierarchize.

<sup>62</sup> Vygotsky (1999), p. 253.

<sup>63</sup> Dirextî pelkderzî (pelderzî): pinophyta, coniferophyta, dirextî sinewberî, dirextî geladerzî, bo nimûne serû, sinewber...

<sup>64</sup> Dirextî pelkpan: broad-leaved tree. Dirextî pelpan, gelapan.

<sup>65</sup> Lêjar: rûy serewlêj, lêjg. Birwane Celizade (*Zarawesazîy pêwane*).

<sup>66</sup> Berzar: rûy berew berazayî, rûwew hewraz. Birwane Celizade (*Zarawesazîy pêwane*).

Ziman yekêkîşe le destawêjekanî zanist. Zanist sûd le adgarî heremîy ziman werdegirêt û saxtarî dîkey heremîy çemik dirust dekat bo rûnkirdinewey dewrûber. Zanist sîstemî bo çemikî heremî le gişt buwarekanda saz kirdûwe, bo nimûne: rêziman, bayolojî, kîmya, ciyogirafî, matematîk w... htd.

Seretay em core reftare legel dewrûber, degerêtewe bo Arîsto. Mirov lem rêbazeda dekwête çemikandinî dewrûber, dakewt çemikamêz dekat. Ger pêwîstîş bû çemikî nwê dirust dekat û le saxtarêkî heremîda, le nêw çemikî dîkey serdest û jêrdestda, cêgîryan dekat. Bo nimûne binemadde<sup>67</sup> dabeş dekirên beser kanza<sup>68</sup> û nakanzada,<sup>69</sup> cîhan dabeş dekirêt beser kîşwerda, mêjû be çax û serdem dête dabeşîn, jînewer dekirêne giyanewer û rwek... Gişt çemikêk le here berhestewe heta here derhest, cêy xoy le sîstemêkî heremîda heye û beşêkî firewanî bîrkirdineweman be gwêrey ew binemagele saxtarbend kirawe.

Fêrge detwanêt be rêbazî sakar belam çust derfet bo fêrxwaz ferahem bikat xerîkî saxtarî heremî çemik bêt. Bo nimûne, mamosta dawa le fêrxwaz dekat le pencerey polewe seyrî derewe biken û her yekeyan nawî babetêk bilêt ke le derewey pole. Mamosta agayane wişey fêrxwazekan le ser textî pol tomar dekat belam be dû stûnî cuda, yekiyan bo wişey serbe siruşt û yekiyan bo wişey serbe ferheng. Ewca mamosta dawa le fêrxwazan dekat bikewine dozînewe xalî hawko le nêwan wişegelî her stûnêkda. Le kotada dawa le fêrxwazan dekat nawî giştî bo ew dû desteye pêşnyaz biken. Lem nimûneyeda, mamosta agayane rê bo fîrxwaz xoş dekat xoyan serlenwê çemik dirust bikenewe û xerîkî helbestinî heremêkî sakarî çemik bin.

Mamostay ziman le polî helkişawtirî bineretîda dawa le fêrxwaz dekat wişey serbe corî wişe û beşekanî riste le saxtarêkî heremîda darêjin. Em saxtare deba le lapereyekda pêşkeş bikirêt û têyda wişey serdest û jêrdest diyarî bikirên û hevbendîyekan be hêl, tîresa û hêma rûn bikirênewe.

## 8) Twanistî puxtandin û peybirdin be peyamî babet

Mirov bo ravekirdinî puxtey basêk, debêt twanay hebêt serleberî baseke derik bikat, giştewey babeteke têgeyiştêbêt û emîş pêşmerce bo têgeyiştinî peyamî babeteke. Puxtandinî basêk pêwîstî be derikkirdinî rehendî kat heye. Mirov debêt twanay hebêt baseke le çêwey zemenîy xoyda bibînêt. Wate hawkat hem sereta û hem kotay babeteke, bo nimûne kitêb, fîlim yan herçîyekî heye, bibînêt.

Ewca mirov debêt twanay hebêt em giştewey dibînêt, berawird bikat be ezmûnî dîkey lem babete ke le hoşda be şêweyekî zimanekî parêzirawin. Her zimanîşe şyanî gişt emane derexsênêt, deyankate berşyan: dey ewe zimane weha dekat ême le naxî xomanda mêjûy xoman bibînîn û bîr le ayendeman bikeynewe.

Lêreda, le sê rwangey ciyawazewe temaşay em twaniste dekeyn: rwangey zimannasîy civakî,<sup>70</sup> rwangey derûnnasîy firajkar<sup>71</sup> û rwangey diyardebînî.<sup>72</sup> Bo rûnkirdinewey yekemyan, rwangey zimannasîy civakî pena bo Bernstein<sup>73</sup> û tojînewekanî debeyn derbarey çînî civakî û zimankarî. Bo

<sup>67</sup> Binemadde: element, tuxmî kîmyayî, elemenît, le kîmyada çemike bo kerestey petîy weha ke gişt atomekanî xawen heman jimarey proton bin le nawkî atomîy xoyanda. Bo nimûne: oksîjîn, haydirojîn, zêr... Binemadde be prosew kîmyakar parçe nakirêt.

<sup>68</sup> Kanza: metal.

<sup>69</sup> Nakanza: nonmetal.

<sup>70</sup> Zimannasîy civakî: sociolinguistics.

<sup>71</sup> Derûnnasîy firajkar: developmental psychology.

<sup>72</sup> Diyardebînî: phenomenography.

<sup>73</sup> Bernstein (1981).

rwangey derûnnasîy firajkar deçîne lay Piaget û Vygotsky, bo rwangey diyardebînî dîdî Ference Marton dekeyne serşar.

Rwangey zimannasîy civakî - Bernstein le tojîneweyekda mindalî çînî kirêkar û çînî navîn dexate twanadozîyekî zimanekîyewe. Mindalekan handiran game leger yekdî biken û paşan dawayan lê kira gemekanî xoyan bo kesêk bigêrinewe ke amadey ew gemane nebûwe. Bernstein ciyawazîyekî rûnî bînî le nêwan gêranewey mindalî ew dû çîne. Huner leweda bû mindal bîr lewe bikatewe ke gêraneweke bo kesêke agadarî bas nîye. Em hunere pêwîstî beweye mirov twanay mewdagîrî hebêt le xudî rûdawekan. Mewdagîrî pêwîstî be çemikî derheste, çemikî xawen pileyekî beriztirî giştandin. Serincgîrî û bêjandinewey beserhatêk be yarmetîy çemikî weha pêşmerce bo ewey baseke berderik û têkbeste bêt bo kesêkî zûtir bêaga lew beserhate.

Bo rûnkirdinewey mebest delêyn mindal hebû lew tojîneweyeda deygut: zor xoş bû, yarîm kird û şeçim le top helda. Mindalî dîke hebû deygut: xoman dabeş kird beser dû tîmî heftkesîda û topanêman kird. Gêranewey yekem kemasîy zore û agadarîy pêwîstî têda nîye. Gêranewey dûhem pena bo çemikî zimanekî debat û beserhateke dekate tabloyekî berderik.

Bernstein pêşanî dedat ke mindalî serbe çînî navîn çemikî zimanekîyan bekar dehêna bo mewdagîrîy pêwîst. Mindalî serbe çînî kirêkar destawêjî zimanekîyan bekar nedehêna û twanay mewdagîrîy pêwîstyan nebû. Bo derbirîn lem cudawazîyey nêwan twanistî mindalanî em dû çîne, Bernstein çemikî “axaftinî bestiraw”, “axaftinî nebestiraw” û herweha “kodî sinûrdarî zimanekî” û “kodî firajûy zimanekî” bekar dehênêt.

Rwangey derûnnasîy firajkar - ger le dîdî Piaget -we seyrî twanistî puxtandin bikeyn ewa degerêynewe bo “pilekanî firajûtin” û degeyne piley çwarem: “piley kirdekiy fermî” (*formal operational stage*), wate ew pileyey mirov paş firajûtinî jînewerî (bayolojî) deygatêt û têtîda detwanêt xerîkî bîrkirdinewey derhest bêt - detwanêt mewda le bestên bigirêt bo beserkirdinewey puxtay ew bestêne.<sup>74</sup>

Ger le dîdî Vygotsky-yewe şirovey em twanistî puxtandine bikeyn debînî ke emîş wek twanistêkî hizirî-zimanekî, dabiraw nîye le bestênî civak û ferhengî xoy. Be boçûnî Piaget ziman karîgerîyekî wehay nîye Leser makî bîrkirdinewe. Vygotsky delêt ziman û bîrkirdinewe hevbendîy diyalektîkaneyan le nêwandaye û herdû la bertawî yekdîn. Lêreda aşkiraye ke bîrdozekey Vygotsky baştir detwanêt derencamekanî tojînewekey Bernstein rûn bikatewe. Mindalekan hawast bûn belam serbe jînge û paşxanî cuda.

Rwangey diyardebînî – çemikî “parçebîn”<sup>75</sup> (atomîzim) û “giştêbîn”<sup>76</sup> (holîzim) dêne te kayewe. Lêreda bîr û stratîjekanî fêrxwaz le fêrbûnda debête mayey serinc. Le tojîneweyekda dawa le fêrxwazan kira nûsirawêk bixwêninewe û paşan raveyekî ew nûsirawe pêşkeş biken. Tojeran dû rêçkey fêrbûnyan diyarî kird. Desteyek le fêrxwazan le peydozîy gişte û peyamî têkstekeda bûn. Mebest dozînewey welam bû bo: em têkste bas le çî dekat? Peyameke çîye? Em rêçkeye be “giştêbîn” û qûlbûnewe nawzed kira. Destekey dûhemî fêrxwaz xerîkî wîrdedozî bûn, degeran bo welamî pirsyarî wek: pirsyar le çî dekirêt? Çî girînge bêtewe yad? Lemyanda parçey nêw têksteke kiraye şamebest, nek giştay serleber. Em rêbazeş be “parçebîn” û rwaletkar nawdêr kira.

<sup>74</sup> Bo wirdbûnewe le pilekanî firajûtin le bîrdozey Piaget -da, birwane: Jean Piaget. *Principles of genetic epistemology* (1972).

<sup>75</sup> Parçebîn: atomism, atomîzim.

<sup>76</sup> Giştêbîn: holism, holîzim.

## 9) Twanistî bekarhênanî çemik û rwangey hemecorî zimanekî wek destawêjî bîrkirdinewe

Bekarhênanî çemik û rwangey hemecor le rastîda binaxeye bo ramanî bîrdozekî. Emeş karêke lay fêrxwaz hasan nîye, bigire aloz û dijaware. Her delêyt, le ravekirdin û şirovekirdinî dewrûberda, berxodanêkî naxekî heye dij be helbestinî bîrdozekîy weha kesanî dîke dayanriştêbêt.

Kirokî kêşeke birîtye lewey mirov debêt twanay hebêt le mêşkî xoyda xerîk bêt berhemêkî hizirîy mirovkirdî mêjûdar û xawen dariştinî zimanekî bikate rwange û bîrdozey xoy. Mirov bo ewey bitwanêt çemik, rwange û bîrdoze bikate destawêjî hizirî debêt tewaw lew çemikane geyiştêbêt û be corêk le nêw xoyda henawçênî kirdibin bo ewey katî bîrkirdinewe nêzîkedest bin. Paş ferahembûnî em bare ewca mirov detwanêt bekaryan bihênêt le karî bîrmendaney corawcorda.

Çemik lem çêweyeda debête corêk le bîrdoze ême bekarî dehênîn bo xuyakirdin, ravekirdin û derikkirdinî diyardeyek. Nawçeyekî ciyografî (geography) bo nimûne dekirêt le çemikî “keş”-ewe temaşa bikirêt, belam deşkirêt heman nawçe be çemikî “ferheng”-îş rûn bikirêtewe. Em dû rwange çemikamêze layenî cuda le heman nawçey ciyografî pêşan deden. Kewate helbijardinî çemik karîgerî heye hem Leser ew encamgeley dête berhem, hem Leser rûnkirdinewey ew encamane.

Bo nimûne, le fêrgeda xerîkî diyardey “geşesendinî nazîzim” -în û debînîn ke ravekirdin û herweha rûnkirdinewey diyardeke wabestey çemik û rwangey karaye: geşesendinî nazîzim derhawîştêy gelehîsteryaye,<sup>77</sup> dirindayetîy zigmakîy mirove, nakokîy çîneyetîye yan mîlîlanêye Leser deramedî sinûrdar. Sazandinî zanyar dekatewe helbijardinî yek yan çend rwangeyekî berdest. Encamîş wabestey rwangey helbijardeye.

Werin bo nimûne temaşay diyardey pêşkewtin bikeyn le rewî xwêndinda: çîye hokarî pêşkewtinî fêrxwaz le xwêndinda? Ger taklayene çemikî zîrekî bikeyne hokar ewe debête nimûneyek lewey be “têbirdinetî”<sup>78</sup> nawdêr kirawe, wate repêşxistinî yek rwange û têbirdinî rwangekanî dîke, leber ewey pêman waye emyan xawen behay ravekarî pêwîste bo ravekirdinî diyardeke. Belam bo ravekirdinî diyardey pêşkewtinî fêrxwaz le fêrgeda pêwîstîman be wirdbûnewey le herdû layenî hem mîrat û hem jînge û herweha le rûkarî corawcorî ew dû layene.

Raste “têbirdinetî” le buwarî zanistîda diyardeyekî bawe belam diyardey “destbijêretî”<sup>79</sup> -yş birewî heye. “Destbijêretî” delêt mirov le nêw boçûn û bîrdozey hemecorda destbijêrî dekat û çî bebaş zanî pesendî dekat. Mamosta begîştî destbijêrkarin. Be kirdewe ew rêbaze heldebijên ke layan pesende. Sazandinî zanyar berdewam xerîkî helwêsteye le ast bijarey corawcorda. Helbijardinîş lêreda deşêt wabestey binemay hemecor bêt, bo nimûne dîdî aydiyolojî, hest û xwast, koşan bêt bo hawrayî yan bo nakokî... htd.

Girînge mamosta “ravekirdin” le “rûnkirdinewe” cuda bikatewe. Têkelkirdinî em dû çemike lay fêrxwaz diyardeyekî bawe. Ravekirdin baş yan xirap rêk dêt legel dakewtda, deşêt zor yan kem dirust bêt. Belam rûnkirdinewe pêwîstî be rwangey balatire. Rwangey corawcor debine yarîder bo rûnkirdinewey rûkarî cuday diyardeke. Peybirdin be cudawazîy nêwan ravekirdin û rûnkirdinewe berokgîrîyekî zimanekî û bîrmendîye.

<sup>77</sup> Gelehîsterya: mass hysteria, mass psychogenic illness (Mpi), mass sociogenic illness, mass psychogenic disorder, epidemic hysteria, hîsteryay gelêr.

<sup>78</sup> Têbirdin: reduction, têbirdinetî: reductionism, rêbazêkî hizirîye le ravekirdinî diyardey alozda pena debate be çemikî sakar. Bo berawird birwane çemikî “destbijêretî”.

<sup>79</sup> Destbijêr: eclectic, destbijêretî: eclecticism, rêbazêkî hizirîye xoy le yek çêwe û rêçkeda nabestêtewe belkû pena debate ber destbijêrkirdinî boçûn le çemik û bîrdozey corawcorda. Bo berawird birwane çemikî “têbirdinetî”.

Le fêrgeda mamosta detwanêt be dawakarî û pirsyarî ciyawaz xerîkî firwajûtinî em twaniste bêt, twanistî penabirdine ber çemik û rwangey firecor, bo nimûne: “emerîka zilhêze, fermû ravey bike!” debînît fêrxwaz heye be hasanî dekwête derbirîn û heyîşe tûşî rêbest dêt. Mamosta rwangey dîke le baseke dekatewe û delêt: detwanin rwangey wek deselatî abûrî, serbazî, siyasî û ferhengî helbijêrin. Ewca kareke lay zorbey fêrxwazan hasantir debêt. Layan xuya debêt ke “hêz” î nêw zilhêz seywane bo çemikî dîkey rûntir. Nimûney dîke bo astî zûtir deşêt lem renga bêt: “guzeranî xêzanî serdemî Vaykîng (Vikings) rave bike”, paşan bo hasankarî rwangey dîkey lê bikewe: kar, xanûbere, xorak, poşak, game, bawer... htd.

Girînge mamosta berdewam wata û sengî çemik wek destawêjêkî bîrkirdinewe bo fêrxwazan rave bikat, agadaryan bikatewe lewey çemik debête yarîderyan bo bexşînî saxtar be bîrkirdinewe. Mebest eweye fêrxwaz xoy pey berêt be girîngî çemik û be twanay çemik le saxtarrêjîda. Vygotsky delêt ne endêşe û ne twanistî afirandin le hîçewe peyda nabin, emane zadey hem yadewerî û ezmûnî mindalin, hem koşanî dewrûbere bo saxtarrêjî ew yadewerî û ezmûngele. Kewate, rênwênîy mamosta nabine kosp û xefênerî xeyal û afirandin lay fêrxwaz - wek ewey lêrew lewê basî dêt - belkû wirûjên û dinederin.

## 10) Twanistî rwangegorkê le cêge û katda

Twanistî rwangegorî girînge bo ewey mirov bitwanêt xoy bixate dunyay beranberewe, xoy bixate hem cê û hem katî ew diyardeyey pêwey xerîke. Em rwangegorîye le naxda kirdarêkî awezmenî zimanekîye. Mebest le rwangegorkê eweye mirov twana bêt - be rêgeyekî zimanekî - biçête naxî beranberewe bo ewey zanyar, hoş, hest û behakanî kesanî beranber werbigirêt û derik bikat.

Le waney mêjûda binemay pitew heye delêt gişt diyardeyek, kes û civakêk, debêt le bestênî xoyda seyr bikirêt, kat û cêy xoy reçaw bikirêt. Em helwêste bo xo ladane le “nejadyaretî”<sup>80</sup> û “serdemyaretî”.<sup>81</sup> Mêjûnas em rêçkeye degirête ber bo xoparêzî le dîdî aydialîstaney pêwerekî<sup>82</sup> bo ravekirdinî mêjû. Kesanî serbe herdû riştey nejadnasî<sup>83</sup> û mirovnaşîy civakî<sup>84</sup> le tojînewey xoyanda, bo mewdagîrî le nejadyaretî û serdemyaretî, katêkî dirêjxayen le nêw ew civakaneda beser deben ke mebestyane lêyan bitojînewe. Emane kar legel twanistî rwangegorîyda deken.

Fêrge detwanêt bekarhênanî em twanistî rwangegorkêye bikate destawêjêk bo geşedan be peybirdinî qûltir, bo firajûtinî kesekî. Dîdarêkî helbeste, belam resen, le nêwan fêrxwaz û kesanî serbe civak û ferhengî dîkey biyanî dête arawe. Lêreda zemîne ferahem debêt bo “nakokîy hizirî”. Em nakokîye hizirîye katêk peyda debêt ke fêrxwaz berkewtî debêt legel kesêkî dîkey xawen rwangey cuda. Kesêkî xawen zanyar, beha, ezmûnî kesekî, pêwer û terazûy biryarde, ke cuda bin lewey fêrxwaz xoy heyetî. Dîmaney lem babete deşêt bibête handerêkî baş bo firewandinî peroşî û gurgandinî helçinî zanyar.

---

<sup>80</sup> Nejadyaretî: ethnocentrism, êtinosenrîzîm, rwangeyeke têyda mirov ferhengî xoy dekate pêwer (norm) bo helsengandinî ferhengî dîke. Dijberî “nejadyaretî” dekate çemikî “ferheng peywendayetî” cultural relativism, emyan rwangeyeke layenî beranber le bestênî xoyda temaşa dekat.

<sup>81</sup> Serdemyaretî: chronocentrism, kronosenrîzîm, rwangeyeke têyda mirov serdemî xoy dekate pêwer (norm) bo helsengandinî serdemanî dîke.

<sup>82</sup> Pêwerekî: normative.

<sup>83</sup> Nejadnasî: ethnology, etnolojî, tojîneweye le mirovgel wek bûnewerî ferhengî le grûpda.

<sup>84</sup> Mirovnaşîy civakî: social anthropology, tojîneweye le mirov û mirovgel le bestênî civakîda.



## Destey sêhem

### 11) Twanistî pejrandinî çemikî nwê

Twanistî pejrandin û zimanandinî<sup>85</sup> çemikî nwê amajeye be twanayekî taybet be mirov: qûlbûnewe û firewandinî agayaney cîhanbînî xoy. Em pêvajoye zadey bîr û ezmûnî hem xoye û hem ew awezmendîye mirovayetî le rewî mêtîda lew çemikeda çandûyetî. Mirov - bemebestî xuyakirdin û lewîşewe rahêzanî saxtarekanî hizir û awezî xoy - “peyiv” dekate hêmay zimanekî bo çemik. Çemik le peyiv mezintire, çemik awezkare û le peyvda, le hêmayekda girdbotewe. Çemik, katêk le peyvda dête derbirîn, debête ew destawêje here girîngey bîrkirdinewey agayane penayan bo debat. Lay mirovî aga, peyiv û bîr debine yek gişte. Vygotsky delêt ewe peyive bîrkirdinewey agayaney mirovkar berşyan dekat.

Firajûtinî hem hizirî û hem danûstên<sup>86</sup> zor zûtir le firajûtinî zimanekî serheldeden. Piaget û Vygotsky, herdûkiyan amaje bem diyardeye deden. Hem zarokî biçûk û hem giyandare şîrderekan twanay bîrkirdinewey pêşzimanekîyan heye û derwestî kirdarî taradeyek alozîş dên. Hem zarokî biçûk û hem giyandare şîrderekan stratîjî danûstanî pêşzimanekîyan heye. Belam danûstan lem aste pêşzimanekîyeda bo geyandinî çemik û bîrokey xo nîye, bo derbirîne le pêwîstîy sozekî û civakî.

Cudawazî mirov û giyanewerî dîkey şîrder eweye lay mirov le katêkî taybetda ew dû firajûtiney hizir û danûstane beyek degen. Lewane rêk em yekangîrbûne bêt mirov dekate mirov - mirovî awezmendî awezmend - *homo sapiens sapiens* - mirovêkî dezanêt ke dezanêt. Ême nazanîn key, çon û boçî em yekangîrîye rû dedat, belam be dîdî Vygotsky em dû hêley firajûtin le temenî dû salîda yekangîr debîn. Ber lem yekangîrbûne, firajûtinî danûstên degate astî derbirîn soz û hevberdîy civakî. Firajûtinî hizirîyş degate astêk tîyda saxtarî pêşzimanekî core twanistgelî wek giştandin, derhestandin û nexşdozî deafirênêt û lemanewe twanay serederîyekî naagayane le dewrûber, twanayekî sosegirî peyda bikat.

Le xalêkî firajûtinda, ke Vygotsky be “wişey hêmakar” nawdêrî dekat, em dû hêle yekangîr debîn. Wişey hêmakar bizozîyekî mezin dedate herdû hêlî firajûtinî hem danûstên û hem hizirî, ke taze bûnete yek. Ew dû firajûtine dekewine pîtandinî yekdî. Emeş debête serşar bo ew diyardeyey be firajûtinî bîrmendaney mirov nawdêr kirawe. Jiyan û guzeranî mirov çîdî wek zûtir namênêt. Lewewdûwa mirov dekewête dû cîhanewe, yek rastîney siruştîkird û yek hêmakarî hoşkird. Mirov, wek Nietzsche delêt, bende le cîhanî hêmada, cîhanêkî hêma ke behêztirîn destawêjî dawete mirov: “çemikî hêmakar - peyiv”.<sup>87</sup>

Twanistî pejrandinî çemikî nwê fire girînge bo firajûtinî twanistekanî dîkey bîrkirdinewe. Vygotsky be wirdî gîrodebûnî hem dakewtî berhest û hem dewrûberî ferhengî be mêtîwewe pêşan dedat. Leber eweye dekirêt bîrdozeyek be bîrdozeyekî “mêtîkirdî ferhengî” nawdêr bikirêt. Sîstemî fêrkariy em serdeme ke bîrdozey Vygotsky dekene binema, zor car cexityan tenha leser layenî danûstane le bestênî civakîda û pitir basyan le karî geldestî nêw pole.

Belam rwangey “mêtîkirdî”-î Vygotsky ziyadîr basî le sengî mamostaye wek ragirî mîratî zanyar û herweha basî le berkewtî fêrxwaze legel kesî le xo twanatir. Le zimanî Vygotskyda “çemikî zanistî” dekatewe ew çemikaney ke le dewrûber û guzeranî rojaney zarokda wêne û rengdanewey rastewxoyan nîye. Wate çemikî weha ke zarok zûtir berkewtêkî xoriskî legelda nebûwe. Bo nimûne: keş, binemadde, kanza, danûstan, şoriş... htd.

<sup>85</sup> Zimanandin: bexşînî wişe be diyardeyek, girdkirdinewey çemikêk le peyvda, le çêwey zimanda.

<sup>86</sup> Danustên: communicative, awelnawe le danustan.

<sup>87</sup> Nietzsche (1998).

Vygotsky delêt girînge fêrge agayane xerîkî çemikî zanistî bêt bo ewey fêrxwaz twana peyda bikat bo dîtin, bo pejrandin û bo têhelkêşkirdinî ew bîroke û awezkaraney mirov le rewteki mêjûkirdda lew çemikaney bar kirdûwe. Fêrge bo fêrxwaz dekewête nêwan dû cîhanî cuda, cîhanêkî berhest û cîhanêkî hizirzay mirov. Le fêrkarîda debêt ewperî twana bixeyne ger bo ferahemkirdinî zemîney lebar bo pêkhatinî em dû cîhane.

«...»

### **Serçawe**

Bernstein (1981): Codes, modalities, and the process of cultural reproduction. *Language in Society*, volume 10, Issue 3, December 1981, pp. 327-363

Celîzade, Mesûd Muhemmed. *Zarawesazîy pêwane*, saytî Mamosta [www.mamosta.net](http://www.mamosta.net):

[http://mamosta.net/Kteeb/Kteebe\\_PDF/ZarawesaziyPeewane.pdf](http://mamosta.net/Kteeb/Kteebe_PDF/ZarawesaziyPeewane.pdf)

Nietzsche (1998): *Om historiens nytta och skada*. Stockholm: Rabén Prisma.

Vygotsky I (1971). *Thought and Language*. Cambridge, Mass: Mit Press.

Vygotsky I (1978). *Mind in Society*. Cambridge, Mass: Harvard University Press.

Vygotsky I (1981). *Psykologi och dialektik*. Stockholm: Norstedt förlag.

Vygotsky I (1995). *Fantasi och kreativitet i barndomen*. Göteborg: Daidalos.

Vygotsky I (1999). *Tänkande och språk*. Göteborg: Daidalos.

<https://johankant.wordpress.com/2020/01/18/att-gora-tankandet-synligt-nytt-poddavsnitt/>

<https://johankant.libsyn.com/website/att-gra-tnkandet-synligt>

«...»